

Bahoz, piştî rawestîna yek deqîçe ji bo Şehîdên KURDISTAN, di 9.4.71 de dest bi Kongra xwey III. a salî kir û di 11.4.71 de bi girtîna van biryarên jêrin, bona pêşkeşkirina gelên Cîhanê, civîna XWE kutâyî anî:

- 1) Kongre, ji Şoreşa Kurdîstana-Nîvro, serekê wê ê mezin General BARZANÎ, Pêşmergeyên leheng, û Partîzanên (PDK) Wê re girêdana xwey germ, silav û daxwazên serketinê pêşkeş dîke. Herwaha PDK-ên di Parçe-Kurdîstanên din de di bin nîrên Zînat, Guvastin, Girtîgeh û her reng êşandinan de têkoşîna xwe dom dîkin re daxwaza seketinan pêşkeş dîke û hevaliya xwe a herdemî bi wan re dide xuyanîkirin.
- 2) Kongre, piştgîriya Hevhatina 11 Avdar 1970, a ku ewtonomiya Kurdîstana-Nîvro naskir, dîke û vê serketina Şoreşa Kurd li Iraqê dizane. Paşê kongre, ji herdu aliyan, di demek kurt de, cîanîna vê Hevhatina ku li Iraqê bibe hîmê Komarek Kurd-Ereb a bi rastî Serbixwe û Demokratî-Gelî, pêwîst dibîne. Kongre, "Lêbibhorîna Giştî" a ku Serektiya Şoreş derxist, rast dibîne.
- 3) Kongre, ji bo gelên Cîhanê, dide xuyanîkirin: ku "Hikumeta Reformîst"(!) li Turkiyê, a bi ûltomatoma 12 Avdar 1971 hate ser hikum, ne tiştek e bêtirî êşkerebûna Faşîzma Veşartî; ku bi destê leşkerê Tirk ê faşîst, Şovennîst û riçperest hate ser hikum ji bo li navrakirina maddeyên Qanûna-Êsasî ên azadîdar û pêşverûyî; û dîsan ku ne tiştek e bêtirî daxwaza leşker bi virrên Kemalîstî, ku ji bîr û baweriyên "Îttihat-Terakki" hatine girtin, menfaetên borjuvaziyên xwe (Tirk) biparêzin û bi zora sîngûyan hêzên gelên Turkiyê ên Şoreşgêrî berbeind bikin. Kongre silavên xwe pêşkeşî birayên xwe ên xort û têkoşer dîke ku li ser doza Junta faşîst û şovennîst bi tawanbariya "Komonîstî û Kurdayetî" hatibûn girtin û ta niha nehatine berdan. Ser de jî lanet ji van kirinên han dibarîne ku bi navê "nîzama qanûna esasî û demokratî", "yekitiya welêt" û li dijî "qelskirîna gelparêztêne kirin. Kongre bi hişkî û nefret dengê xwe li dijî leşkerê Tirk ê xwîn-mij, sadîst û faşîst bilind dîke ku pêşiya kirinên komandoyên riçperest û şoven li Kurdîstana-Bakur nagre û her ku diçe bi vacayî wan bêtir dîke. Kongre di wê baweriyê de ye ku hemû rêxistinên pêşverûyî (ên her-rengî) li Turkiyê, bi piştgîriya wergera hikumetê bi destên leşker ji bo anîna faşîzma xwey vekirî, ketin çewtiyek pîrr mezin. Kongre, gişt rêxistinên pêşverûyî, ên ku piştgîrî an jî alîkariya têkoşîna gelê Kurd dîkin, sipas dîke.
- 4) Kongre lanet li rejîma Şah, a paşverûyî, dibarîne ku di van rojên dawî de 16 Kurdên gelparêz û şoreşgêrî kuşt û bi hezaran şoreşgêr (Kurd, Fars û Azerî) di zîndanên de diêşîne. Kongre piştgîrî û doza pêkanîna yekitiya giştî rêxistinên Îranî, ên pêşverûyî dîke ku ji bo pêkhatina demokratîyek netewî û serbixwebûna gelên Îran têkoşîna dîkin.

- 5) Kongre dide xuyanîkirin: ku "Kembera Erebi", a ku partiya Beesî Surî li Kurdistana-Navîn bi kar tîne, pîlaneke ku mafên merovtî dide bin lîngan û li navrakirina netewekî ye û hovberiya çavsorî ye. Kongre rawestandina van pîlanên nemerovtî, rakirina "Kembera Erebi", vegerandina mafên Rûniştvanî û dayîna mafên Kurd ên bingehî-gelî-civakî û rêzanî doz dike.
- 6) Kongre ji bo rêdana PD-Kurd, naskirina gişt mafên civakî-gelî û rêzanî û dayîna mafê Rûniştvanî ji bo 23 000 Kurd, sipasî karbidestên Lûbnan dike.
- 7) Kongre ji Serketinên gelên Rojhêlata-Dûr, Navîn û Nêzik, Efrîka, Ewropa û Latîn-Emerîka re, a ku li dijî împeryalîzm ji bo Serxwebûn û gişt mafên xwe ên gelî-civakî (çekdar an demokrati) têkoşînê dikin, silavê xwe dişîne û piştgiriya xebatê wan dike.
- 8) Kongre bi hişkî dengê xwe li dijî wan hikumetan bilind dike ku alîkariya leşkerî, ku li dijî gelê Kurd bi kar tînin, didin hikumetên paşverûyî-faşîst û riçperest, ên ku Kurdistan di nav xwe de bi zordarî parve kirine.
- 9) Kongre li dijî wan rêxistinên dengê xwe bilind dike û vegera wan ser Pêwestiyên xwe doz dike, ku bi ramanên aşitî, alîkariya civakî pêkhatine (wek UNO), lê destgîrêdayî ji hovberî, eşandin û zînatê ku li gelê Kurd dibe temaşê dikin.
- 10) Kongre, gişt rêxistinên (siyasî û nesiyasî) ku ta niha piştgiriya Têkoşîna gelê Kurd (a çekdar û demokrati) kirine, sipas dike.

Ev biryarana bi zîmanê kurdî, tirkî, inglîzî û elmanî hatin çap kirin û belavkirin.

B A H O Z  
 Räckarbergs, g. 80  
 75232 Uppsala-Schweden